

**DEPARTEMENT
GESUNDHEIT UND SOZIALES**
Kantonaler Sozialdienst

13ê Îlona 2021ê

BELGEYA RAGIHANDINÊ

Daxwaza dayîna zêdebarî ya xizmetên civakî li sitargehên penaberan

Rewşa seretayî

Heta roja 30ê Îlona 2020î penaberên bifermînaskirî û yên ku demkî hatine pejirandin û keêsn xwedan karta naskirinê ya rewşa dijwar a B li sitargehên penaberan ên Kantonê li gorî şêwaza penabertiyê, alîkariyên civakî werdigirtin. Penaberên B û F û kesên xwedan rewşa dijwar a B, li gorî destûrkara SKOS'ê (Şêwazên normal ên alîkariya civakî), alîkariya civakî werdigirin. Ji ber vê yekê, Wezareta Tendurustî û karên civakî ya Kantona Aargau'yê ev pêvajoyên guherandiye.

Ji destpêka Cotmeha (Oktober) 2020î va li gorî destûrkara SKOS'ê, alîkariya civakî bo penaberên B û F û kesên xwedan rewşa dijwar a B ku hîn li sitargehên penaberan dijî tê raberkirin. Ev pereyên alîkariyên civakî zêdetir ji Şêwazên Penabertiyê ne. Derfeta raberkirina daxwazê jibo dayîna zêdebarî ya alîkariyên civakî jibo heyama demî ya di navbera 1ê Cotmeha 2015an heta 30ê Îlona 2020î li cem Xizmetên Civakî yên Kantonê heye. Daxwaz bi awayê babetî tê vekolandin. Xizmetên Civakî ya Kantonê biryar dide ku gelo mafê dayîna beşên paşketî yên alîkariyên civakî heye an na.

Ev belgeya ragihandinê pêkhatî ji lêzanînên girîng jibo penaberan (B û F) û her wiha kesên xwedan rewşa dijwar a B ye ku dil hene daxwaza xwe raber bikin.

Xala girîng di raberkirina daxwazê da

Ez çawa dikarim daxwazê raber bikim?	"Daxwaza dayîna zêdebarî ya alîkariyên Civakî li sitargehên Penaberan" tijî bike. Eger tu di navbera 1.10.2015 û 30.09.2020 da li sitargeha penaberan jiyayî û di bin miqatebûna Xizmetên Civakî ya Kantonê da bûyî, wê yekê ji Xizmetên Civakî ya Kantonê ra bişîne (Pêzanînen têkiliyê li nav formêl hene). Eger tu li sitargeheke penaberan jiyayî ku beşa bajarî berpirsa wê ye, daxwaza xwe bo beşa bajarî bişîne.
Çi kesek dikare daxwazê raber bike?	Eger ev sê pêşmerc hevdem digel te hebin, tu dikarî daxwaza xwe raber bikî: 1. Eger tu penaberekî bifermînaskirî (Karta Naskirinê ya B) an penaberê bi awayê demkî pejirandî yî (Karta naskirinê ya F) an eger xwedan karta naskirinê ya rewşa dijwar a B yî. 2. Tu di heyama navbera 01.10.2015 û 30.09.2020 da li sitargeheke penaberan jiyayî. 3. Te biryara penabertiyê an rewşa dijwar a B di vê heyamê da wergirtiye.

Ez çiqas pere werdigirim?	<p>Ev yek divê di her rewşekê da were hesabkirin. Dayîna zêdebarî, ciyawaziya navbera alîkariya civakî ya asayî û alîkariya civakî ya Penabertiyê ye.</p> <p>Eger hîn jî rêzîkhesaba rabernekirî ya te (wek mînak kirêya malê an heqê sîgortaya Dermanî) li cem xizmetên Civakî heye, ev babet dikarin di berdêla dayîna zêdebarî bîn safîkirin û cebirandin.</p>
Gelo mafê malbata min jî heye?	<p>Eger tu pêştir wek malbatek li sitargeha penaberan jiyayî, tu dikarî hevê digel hevjin an hevparê jiyana xwe yê tomakirî daxwazê jibo xwe û zarokê xwe yê biçûk bidî. Her du hevparên jiyane divê daxwazê wajo bikin.</p> <p>Xortên ku îro gihîştine te, menê qanûnî, divê bi xwe daxwaza xwe raber bikin. Ev yek eger ev kes di heyama jiyana xwe da li sitargeha penaberên biçûk bûne jî rast e û derbas dibe.</p>
Ez heta kengê dikarim daxwazê raber bikim?	<p>Heyama sînordariyê 5 sal e û hemî daxwaz herîpirr heta 1.10.2025 bi dawî dibin.</p>
Çi şert û merc hene?	<ul style="list-style-type: none"> Eger tu daxwaza xwe beriya 31.03.2022 (Roja daxwazê) raber bikî: Rojên mayîna li sitargehên penaberan di navbera 01.10.2015 û 30.9.2020 da tîn berçavgirtin. Eger tu daxwaza xwe piştî 31.03.2022 (Roja daxwazê) raber bikî: Tenê rojên mayîna li sitargehên penaberan ku kêmtir ji 5 sal ji roja vê daxwazê bin, tîn berçavgirtin.
Gelo divê pere vegeřinim?	<p>Ev yek girêdayî bi rewşa te ya aborî ye. Di esas da, dayîna zêdebarî beşeka alîkariyên civakî ye û loma divê were vegeřandin.</p>
Gelo divê rapor bidim ku ez çiqas pere werdigirim?	<p>Belê, eger tu hîn jî alîkariyên civakî werdigirî, divê wê yekê ji xizmetên civakî yên beşa bajarî ya xwe ra ragihînî.</p>
Gelo bi dayîna zêdebarî, deynên alîkariya civakî yên min zêde dibin?	<p>Bi dayîna her cûre dayîneke zêdebarî, deynên alîkariya civakî yên te jî zêde dibin.</p>
Têkilî di rewşa hebûna pirsan Ez dikarim ji ku agahiyan bi dest bixim?	<p>Eger derbarê vê belgeya ragihandinê da an raberkirina daxwazê pirseke te heye, tu dikarî serdana vir bikî:</p> <p>Navenda Têkiliya karên Penabertî û Penaberan Rohrerstrasse 7 5000 Aarau Telefon: 062 835 20 20 fluechtlingswesen@ag.ch</p>